Rûway zigin

Rûjig le rûjel, yê rûwayg bü ke firye birsîyê bü u fîr xurak ekird. Her çenê teqaLa ekird xurak nadî ewa. Ta axerê rûwage çü e rê sük wêşege (çirr, cengel) ta beLkim le ûra xurak bünêd ewa. Le nawkawew dar gepig dî ke le payey kunayg daşt.Le naw kunage cerreyg (beste) bü. Rûway le birsî mirdig fikr kird beLkim xurak le naw cerrege bêd, u firye xweşî kird. Rûwa perrî e naw kunage u he cerrege waz kird dî nawê pirrê xurake, nan u gûşt u mîwe pirrê bü!

Baxewan pîrig haw beste (cerre) nagî e naw kunage ta düyaxir erê çaşt buxwadê.

Rûway xweşaL binya na xurakege buxwad. Wextê xurake gişтê xwardî hest we tinigî kird u xwast le kuna eryêd ta biçêd e rê cûig le ew nizîkîyele erê xwey aw eLqurrnê (buxwad). Imca, rûwa her çenê teqaLa ekird le kuna eryê natwanist. Ezanid era?
Çun rûwage ew qerge xurak xwardü, zigê pelemyagî u natwanist le kuna eryêd ew der. Rûway bedbext firye xuse xward u we xwey wet:
“Ey kaş berce ma perrîm e naw kunage, girrig fikr ekirdim"

Seywan Qember (www.feyli.se)